Bilûra Evîndar

Demhat Hezexî

Evîndaro
Ji dilê xemla zozanan
Tê guhê min
Melodiya bilûra te..
Û ew
Dengê nazdar
Dibe siwarê daxwaziyê..
Sîper û çeperên avakirî, hildiweşîne
Hestên razayî
Ji xewa kûr
Şiyar dike.
Evîndaro
Pêlên dengê bilûra te
Xwe digihîne canê min,
Jê dixwe parçe parçe.
Û dûv re,
Ew dibe agirek gerok
Di nava min de,
Gur dibe!
Niha jî..
Pêl pêpelûkên
Awaza bilûra te dikim,
Ber bi cîhana te ve têm
Da bibim parçek
Ji dengê dilê bilûra te, evîndaro!